Network for an Alternative Quest
http://www.networkaq.net/

Konferansa II'yemîn: 3-5 Nîsana 2015, Hamburg

Bername û nivîsar û vîdeoyên din li ser vê malperê bi dest dikevin: http://networkaq.net

Banga ji bo Gotaran

Xitimîna sîyasî, ku ji dehsalê 60î û 70î û vir ve heye, vê dawîyê ji bo tevgerên alternatîf hîna jî xerabtir bû. Sosyalîzma reel hilweşîya, femînîzm piştî asta xwe ya herî bilind a sale 1980î û heta 1990î leza xwe wenda kir, anku bi rastî jî kapîtalîzmê bêdawîbûna xwe ragihand. Lê belê hin rewşenbîr, tevger û rêxistin hebûn û hîna jî hene, ku di lêgera xwe ya ji bo jîyaneke alternatîf de her berdewam in. Di vê Konferansa Duyemîn a "Berxwedana li dij Modernîteya Kapîtalîst' de em hez dikin bêhtir bala xwe bidin ser hegemonîya çandî, aborî, azadîya jinê, ekolojîya civakî, desthilatdarî û her yek nêrînên Tevgera Azadîxwaz a Kurdî. Komîteya amadekar dixwaze derfetê bide xwendekar, zanist û herkesekî din, da ku bikaribin lêkolîna xwe li beşdarên konferansê pêşkêş bikin. Lewma em we vedixwînin li ser yek an jî bêhtir mijarên li jêrê gotara xwe pêşkêş bikin.

1 – Hegemonîya Çandî: Gramsci û 75 salan paşê Öcalan

Herçend Öcalan dikarî encax vê dawîyê Gramsci bixwîne, lê belê Öcalan di pirtûkên xwe yên berê de di zerengîyeke re digihîje encamên wekhev. Öcalan herweha hewce dibîne li ser maneya rewşenbîrbûnê û rista rewşenbîr a di veguherîna civakê de kûr bibe. Ew herdu jî kîja çîn dibe bila bibe, rexne li desthilatdarîya çînekê digirin. Cudatîyên navbera Öcalan û Gramsci çi ne û ew çiqas nêzî hev in. Mijara lêkolînê ya gotarê divê ev pirs bin.

2 – Deshilat û Rastî. Li cem Öcalan û Foucault têgiha deshilatdarîyê

Herdu rewşenbîr, Öcalan û Foucault, qala wê yekê dikin, ku desthilatdarî li her derê ye, nemaze jî di serdema kapîtalîzmê de. Öcalan binxêz dike ka desthilatdarî çawa daketîye her takekesekî û bi vî awayî pergal xwe ji nû ve hildiberîne. Li cem Foucault 'desthilat/zanîn' destnîşan dikin ka desthilatî bi têgihiştinê zanînê, bi formên agahîyê û 'rastîyê' re desthilatdarî tê ava kirin. Öcalan herweha li ser rejîma rastîyê kûr dibe, da ku bingehên me rave bike û bersiva çima pêşî li xwe ji nû ve avakirina pergalê nayê girtin bibîne.

3 – Femînîzm û Kurd

Tevgera Jinên Kurd li herêmê ya herî hêzdar e. Lê belê peywendîya navbera bingehên wê yên teorîk û femînîzma sosyalîst, radîkal û anarşîst a rojavayî çawa ye? Helwêstên resen ên femînîzma Kurdî çi ne? Û li cem Kurdan femînîstê ku herî zêde tê xwendin çima bixwe zilamek e?

4 – Li dû Marks: Braudel, Wallerstein û Öcalan li ser Aborî û Kapîtalîzmê

Öcalan di wê bawerîyê de, ku tevgera Kurdî jî tê de, tevgerên alternatîf di warê nirxandina aborî û kapîtalîzmê de qels in. Lewma wî awireke berfireh dide rehên aborîyê û ka aborî çawa dikare paş de stendin. Di vê çarçoveyê Braudel û herweha Wallerstein dikarin werin nirxandin ka li cem wan çi wekhevî hene û lêzêdekirinên nû yên Öcalan çi ne?

5 – Konfederalîzma Demokratîk – Sepandina Ekolojîya Civakî?

Ne Murray Bookchin ne jî Öcalan bi tenê teorîsyen in. Herdu jî fikr û ramanên xwe dixin/xistin pratîkê. Peywendîya navbera ekolojîya civakî, şaredarîya azad, 'îdeolojîya azadîya jinan', têgiha konfederalîzma demokratîk û hewldanên ji bo sepandina wan çi ne? Pirsgirêkên ku tevgera sîyasî ya heyî rûbirû dimîne, çawa hewlê dide wan çareser bike û ev yek çawa di pêşxistina teorîyê de tevkarîyê dike?

Ji bo Gotaran Agahîyên Teknîkî

Pêşniyar divê heta 10ê Adara 2015 werin radest kirin, lê belê divê hûn heta naverasta meha yek kurteyekê bigihînin ber destê me. Gotar divê ji 1500 peyvan pêk werin û bi ser 2500 peyvan nekevin. Li ser her yek wan mijarên li jorê gotarek dê were hilbijartin û nivîskar dê derfetê bi dest bixe gotara xwe di rûniştineke têkildar a konferansê de pêşkêş bike. Hin gotarên ku guncav hatin dîtin dê di pirtûçeya konferansê de werin çap kirin.

Tarîxên Girîng

12.12.2014: Banga gotaran hat kirin
15.01.2015: Kurteyên gotaran
10.03.2015: Gotar ji bo desteya nirxandinê
20.03.2015: Bersiva nirxandinê ji bo xwediyên gotaran
3-5.04.2015: Konferans

Navnîşana ji bo têkilîyê

cfp@networkaq.net

Network for an Alternative Quest: Însîyatîfa Navneteweyî ya "Ji bo Öcalan Azadî–Ji bo Kurdistanê Aşitî" • KURD-AKAD – Tora Akademîsyenên Kurd • YXK – Yekîtîya Xwendekarên Kurdistanê • Kovara Kurdistan Report • ISKU – Informationsstelle Kurdistan e.V. • Cenî – Buroya Aştîyê ya Jinên Kurd • Civaka Azad–Kurdisches Zentrum für Öffentlichkeitsarbeit • Akademiya Zanistên Civakî ya Mezopotamiya (Qamişlo) • SAMER – Navenda Lekolînên Siyasî û Civakî (Amed)